QESÎDA RABÎ EDEWÎYE

Belavkirin : Rêsan Hesen

Bi Desturi Xudê

Heyî limin cemandibun weliye.
şex cinêdî şiblîye.
şex marufî kerxîye.
bazîdî bastemîye.
dawidî tixubîye.
Li derê şeref xana were di çîye.
rabî ji mire deranîye.

rabî edewîye
hayî aşiqa heyrano
sura edewiye

* * *

Xelkê xafilî şenge.
denge bi çu renge.
da ji heya biçit renge.

* * *

xelkê xafil yî kore.
Şex bazîd mêrekî pîre.
Şerim kir biçte dîwanê feqîre.

* * *

rabî ciwaneke çake.
gerya bû zikak bi zikake.
rabî li vî dengî Qewî mişţaqe.

* * *

rabî edewîye
hayî aşiqo heyrano
sura edewîye

* * *

rabî edewîye
Girte berxo berrî u wêdiye.
Şivanekî di bînîye.
Ji şivan di pirsîye.

* * *

Şivano şivane
te mal xirab nebit li wan rane.
te ne dîtîye ew sultane.
yê dilê rabî pê dibit heyrane.

* * *

Şivan di bêjit.
êbbit li te hirmetê.
eve Çil sale di kêşime xîretê.
hêş rastî ji dilê min dernetê.

* * *

rabî edewîye
hayî aşiqo heyrano
sura edewîye

* * *

rojekê sibehîye.
min siwarek bi rêve dîye.
li berde tanc u hillen xerqê nuranîye.
mane ji berî Çil salî min dizanîye.
eve Surra şêxê adîye.

* * *

rabî edewîye
wê Girte ber xo berrî u wêdîye.
Ço ser merzê bîrê – merzê bîrê vednuziye.
dît xulQetek yê tênîye
xuzî me bi zanîye miraza vî xulQetî Çîye.

* * *

hey rabî edewîye
aşiQo heyrano
Sura edawîye.

* * *

ji keremê min dave.
ewî heywanî we Cewab di dave.
ya rabî hizreta min piçek ave.

* * *

rabî edawîye.
kêrek ji berîka xo deranîye.
havête kezyêt xo u ji binî da birrîye.
kire şerîtekî nuranîye.
gehşte binê bîrê av bi şimka xo deranîye.
da bu wî xulQetê tênîye.
hêr ji xulQetî di têye.
bere jêr rênî , dit Gayî u masîye.
bere jor rênî, dît erş u kursîye.
dît hefit tebeQêt erda u ezmana wê li ser kefa sultan êzîye.

* * *

heyî rabî edawîye
hayî aşiQo heyrano
Sura edawîye

* * *

rabî av da dêra
dît Qub u hilêla
kursyê lê dibo Cebêra.

* * *

rabî têm avdaye.
mexsusa dure haye.
xêr kera xêr Cizaye.

rabî edawîye
aşiQo heyrano
Sura, edawîye

* * *

xeber gerya bu li welata
rabî tê ji xirabata
Li serî heye kiramata.

* * *

her Çar birane.
Vêkra diden dengane.
dilê her Çara kursiyê hebîbê rehmane.

* * *

her Çar birayê gulbabe.
Ji malê Çone pişt ave.
go tu bixêr hatî min dave.
mêvan werin bila ji derve bit miskînê zave.

* * *

rabî we dibêjîye.
mêvanê min bo welîye.
hindiro gulxanê nîye.

* * *

rabî we dibête
yê bibte zava bila nête.
min ji wî Qewî Şerme u fehête.

heyî rabî edawîye
hayî aşiQo heyrano
Sura edawîye.

* * *

wê dibêjit Şex bazide
ya rabî tu bi Cida.
em Şêxîn tu miride.

* * *

ez mirîdê şêxê xome.
Ji berê ne lewh hebu ne Qeleme.
Şêxê min ewe li Sema.

* * *

Şêxê min Sultane.
di destîda mişura mêrane.
serê hemwê îmane.

* * *

Şêxê min heweste
gustîla Qudretê wê li deste
sed wekî te u pixember pêş ve di weste.
mêr hatin maşê xo jê di xuste

* * *

rabî edewîye
hayî aşiQo heyrano
Sura edawîye

* * *

pişti Çil salê dîye.
Şêxek dê ji Şam rabîye.
laliş meQamê wiye.
navê wî siltan şîxadiye.
hun dê bine xulam u ez dê bime cêrîye.

* * *

pişti Çil salê temame.
Şêxek dê rabit ji Şame.
laliş meQame navê wî siltan şîxadî eleîhiselame.
ez dê bime Cêrîye hun dê bine xulame.

* * *

kerem kerema mêrane
ŞifQet ŞifQeta padşane.
serê hemwê îmane.
kesê bawerî bi hirmetê nîne

* * *

rabî edawîye
hayî aşiQo heyrano
Sura edawîye

* * *

sêrbikê avê bînin
beyana lê bi cebrînin
xelkê lê di bihîstine
lê jiwe keremê dihestine

* * *

Şex bazîd mêrekî bi kare.
wekaz bijartibu ji nav dare.
wekaz li şerbik da şerbik u kelêt avê têkda îna xure.

* * *

rabî dibêjit
heyfa min li wê têt.
mêr wekî te li dîwanê yê şermîn yê şermezare

* * *

dor hatîye ser rabî sermeste
destûr ji xudê u mêra di xuste
pişta xo bi siltan şîxadî ve di beste
Wekaz hilgirtibû bi deste
Wekaz li şerbik da şerbik di şikeste

* * *

rabî edewîye
hayî aşiQo heyrano
Sura edawîye

* * *

bi Qudreta Celile.
rabî şikandibû sebîle.
av mueliQ westandibû li Qendîla

* * *

ew bû mîrehêt ellah
Vêkre didin medeh
ya rebî raste u sed Car raste

* * *

ew bû mirê mabûde
vêkre didin xidude
dê cine ber şixadi u rabîne sicude.

* * *

em di kêmin u xudê yê temame

ev Qewle ji Şex elo xelef hatîye wergirtin li sala 1998-8-14 li dihuke